Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1091 | 16-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

Em çima nikarin pirtûkan bixwînin?

Nebûna xwendinê ji bo hin kesan pirsgirêkek hevpar e. Dibe ku gelek sedemên vê yekê hebin, û rewşa her kesek dikare cûda be. Li vir çend pêşniyar hene ku ji bo kêmbûna xwendina pirtûkê derbasdar bin:

Pirtûkên ku li gorî berjewendîyên we ne hilbijêrin: Hilbijartina pirtûkên ku mijarên ku hûn bi rastî eleqedar in vedihewînin, dikarin motîvasyona xwendina we zêde bikin. Pirtûkên li ser hobî, hezkirin an berjewendîyên xwe bibînin.

Bi pirtûkên kurt û hêsan dest pê bikin: Li şûna pirtûkên dirêj û tevlihev, bi pirtûkên kurttir û hêsan têne xwendin, dikarin motîvasyona we zêde bikin. Hûn dikarin berê xwe bidin vebijarkên gihîştîtir, wek pirtûkên çîrok, kurte roman, an pirtûkên zanistî yên populer.

Rûtînek xwendinê saz bikin: Sazkirina rûtînek xwendinê ya birêkûpêk dikare bibe alîkar ku ew bibe edet. Her roj demek diyarkirî tenê bi xwendina pirtûkan derbas bikin. Mînakî, serê sibê an êvarê ji bo demekê bala xwe bidin xwendinê.

Amûrên teknolojîk bikar bînin: Hûn dikarin tecrubeya xwendina xwe bi karanîna amûrên teknolojîk ên wekî e-pirtûk an pirtûkên dengî cihêreng bikin. Hûn dikarin firsendê bibînin ku pirtûkan bixwînin an jî li ser têlefon, tablet an jî e-xwendevanên pirtûkên deng guhdarî bikin.

Tevlî kom an klûbên xwendinê bibin: Komên xwendinê an klûbên pirtûkan firsendek mezin peyda dikin ku hûn li ser pirtûkan nîqaş bikin û bi kesên din re ramanan bidin hev. Bi tevlîbûna komên weha, hûn dikarin ezmûna xwendinê veguherînin çalakiyek civakî.

Rêbazên xwendinê yên alternatîf biceribînin: Sedemek bingehîn a nebûna xwendinê dibe ku bi dîtbarî an bi baldariyê ve girêdayî be. Di vê rewşê de, hûn dikarin pirtûkên wêne, romanên grafîkî an pirtûkên dewlemend ên dîtbar biceribînin. Her weha hûn dikarin hawîrdorek bêdeng biafirînin da ku meriv hêsantir bike, an jî medîtasyon an teknîkên baldariyê biceribîne da ku ji we re bibe alîkar ku hûn bala xwe bidin.

Zextê li xwe nekin: Xwendin karekî kêfî ye û zexta nehewce li ser xwe dibe ku we hê bêtir bêhêz bike. Wexta xwe bidin ku hûn ji pêvajoya xwendinê kêfê bigrin û ji xwendinê kêfê bistînin ne ku bala xwe bidin ser leza xwe an çend pirtûkên ku we xwendiye. Bînin bîra xwe, leza xwendinê û adetên her kesî cûda ne. Ya girîng ew e ku hûn bi leza xwe dest bi xwendinê bikin û pêşve bibin. Bi lezek hêdî dest pê bikin an bi gavên piçûk dest pê bikin dikare ji we re bibe alîkar ku hûn pirsgirêkê çareser bikin.



Çavnebarî têkîliyên me xerab dike

Her çend bê berhevdan bijî jî, xwezaya mirov xwe bi mirovên din re dide ber hev. Berawirdkirin dikare bibe sedem ku mirov xwe li gorî wekhevî an cûdahiyên xwe yên bi kesên din re binirxînin û bandorê li xwebaweriya wan bike.

Lêbelê, dibe ku meriv bêyî berhevdanê bijî, û dibe ku ew nêzîkatiyekê tendurist be jî. Li vir çend stratejiyên ji bo jiyanek bê berhevdan(çavnebarî) hene:

Li ser xwe bisekinin: Girîng e ku hûn xwe nas bikin, nirx û armancên xwe destnîşan bikin. Dema ku destkeftî û pêşkeftina xwe dinirxînin, dev ji hevberdana xwe bi kesên din re berdin. Fêr bibin ku li ser bingeha motîvasyona hundurîn û razîbûna xwe bijîn.

Qebûlkirin û teqdîrkirin: Girîng e ku hûn xwe ji bo ku hûn in qebûl bikin û binirxînin. Her kes xwedan karîn, serpêhatî û rêwîtiyên xwe yên bêhempa ye. Li şûna ku hûn bi domdarî xwe bi yên din re bidin ber hev, hêza xwe kifş bikin û binirxînin.

Armancên xwe dêynin: Bi danîna armancên xwe, xwe motîve bikin. Divê ev armanc li ser pêkanîna potansiyela we ne ku tenê bi yên din re bêne berhev kirin. Hûn dikarin bi balkişandina li ser mezinbûna kesane, mezinbûn û xwe-vedîtinê bextewarî û razîbûnê zêde bikin.

Empatî û piştgirî: Girîng e ku meriv pîroz bike, piştgirî bide, û empatiyê ji bo serkeftina kesên din nîşan bide, ne ku wan bi yên din re bide ber hev. Li şûna hevrikiyê bi kesên din re, hevkarî û hevgirtin dikare têkiliyên we yên mirovî xurt bike.

Bikaranîna medyaya dijîtalî sînordar bikin: Medyaya dijîtalî dikare bibe platformek ku bi domdarî mirovan teşwîq dike ku bi yên din re hevber bikin. Bi sînorkirina karanîna medyaya civakî, hûn dikarin ji zexta berhevdana xwe bi yên din re dûr bisekinin. Girîngiya hebûna di jiyana rast û di ezmûnên xwe de bi bîr bînin.

Sudoku: Bersiv 1

3	9	8	7	2	4	5	1	6
1	2	5	6	8	9	7	4	3
4	6	7	1	3	5	2	8	9
7	5	4	8	9	3	1	6	2
8	9	1	5	6	2	4	3	7
6	3	2	4	7	1	8	9	1
5	7	6	9	1	8	3	2	4
2	4	8	3	5	6	9	7	1
9	1	3	2	4	7	6	5	8

Sudoku:Pirs 2

					6		8	4
7					9	3		5
4		6		7	5		1	
						5		1
	7			2			4	
3		2						
	3		9	8		6		2
5		7	4					8
2	9		6					

FERHENGA BIWÊJAN

Pora kûçikan ji ber diwere:
Gotinên wî pir giran in.
Xebersar e:
Gotinên nebaş ji devê wî derdikevin; mirovan bi gotinên xwe diêşîne.
Xêr û xweşî li te barîn, kevir û kuçik li min barîn/xêr û xweşî li te bibarin, kevir û kuçik li min bibarin:
Tişta hatî serê min bila neyê serê ti kesî, tiştek nema ku neanîn serê min.
Xwe pîvayê/xwe hilpîvayê:
Dijûn kirinê; bi nav û nîşan dijûn kirinê; got ezê wiha li te bikim.
LI SER AXAFTINA SERGIRTÎ
Avêt ber:
Sergirtî jê re got; xwest niyeta wî fêr bibe.
Pir xwest bidiyê; ji bo ku jê bigire lava jê kir.
Ber ve avêt
Bi heman wateyê.
Bin re diaxive:
Ne bi awayekî eşkere, bi dizî dibêje; sergirtî diaxive.
Bibinik e/Bibinî ye:
Ji bin ve ye; tiştên xwe eşkere nabêje.
Di ber re avêt:
Sergirtî jê re got; xwest niyeta wî fêr bibe.
Tiştek di bin de heye:
Hinek tiştên ku her kes nizanibe dizane.
LI SER ÇANDÊ Û STIRANAN
Avêtin ber hev:
Ji hev pirsîn; ji hev re gotin.
Zarokan mamik avêtin ber hev.
Her ku yekî stiranek digot, yê din jî yek digot.
Dengbêjên gund avêtin ber hev.
Avêt ser:
Stiranek li ser got. (Ji bo miriyan jî dibe, ji bo zindiyan jî(
Diavêjin ser hev:
Stiranan, yan helbestan li ser hev dibêjin.
Li ser wê hatiye:
Derbarê wê de hatiye gotin.
Ketin binê darê:
Bi saetan avêtin ber hev.
(Ev bi taybetî ji bo dengbêjan tê gotin. Dema demeke dirêj stiranan diavêjin ber hev, hingê tê gotin)
LI SER VEŞARTINA DERD Û HIZIR
Ava bibinik e:
Tiştên wî bi dizî ne; tiştên xwe ji ti kesî re nabêje.
Diavêje hundirê xwe:
Derdê xwe vedişêre; ji ti kesî re nabêje.
Diavêje nava xwe:
Bi heman wateyê.
Di zikê xwe de axivî:
Bi awayekî eşkere negot; eşkere nekir; di dilê xwe de got; nîvco got; di devê xwe de axivî.
Derdê xwe dixwe:
Pirsgirêkên xwe eşkere nake, dadiqurtîne; derdê xwe ji ti kesî re nabêje.
Ji zikê xwe axivî:
Ya di dilê xwe de got.
LI SER XEMSARIYÊ Û KARÊ SERESERE
Agir berda konê xwe da zomê:
Tişt jê re ne xem in; xemsar e.
Agir berda komê xwe da feza zomê:
Bi heman wateyê.

‘Em ê bi tekoşîn û remanê azad tevahî jinan azad bikin’

Rîhan Loqo diyar kir ku kampaniya gištî ya KJK’ê ya ji bo piştgiriya jinên Şengal û Efganistanê bi piştgiriya tevahî Rêxistin û Saziyên jinan yên bakur û rojhilatê Sûriyê bi rê ve çû û got, em ê bi têkoşîn û ramanên azad tevahî jinan azad bikin.**R-2**

Şoreşa çandî û wêjeyî li Rojava

Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji bo civakê guhertin û veguhertinên mezin ji hemû milî ve pêkanîn. Wêjeya kurdî ya nûjen jî yek ji wan aliyên ku bi agirê şoreşê hat vejandin, helbestvanê kurd Necim Ebdullah(Elî Roj) diyar kir ku Şoreşa 19’ê Tîrmehê bû bingeha pêşketina xebatên wêjeyî û çandî. **R-7**

Radiyoya Rojava dengê berxwedana gelan e

Radiyoya Rojava di sala 2013’an li Qerçoxê dest bi weşana xwe kir, bû şopdara rastiyê û dengê berxwedanê. Endamên radiyoyê dan zanîn ku ew ê bi ruhê şehîdên şoreşê û li ser xeta şehîdên çapemeniya azad, li ser şopa heqîqetê û azadiyê, bibin dengê gel û şoreşê.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1091 | 16-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

PÊNGAVA 15’Ê TEBAXÊ TÊKBIRINA MEJIYÊ FAŞÎZIM Û DAGIRKERIYÊ YE

Pêngava 15’ê Tebaxê azadiya nasnameya gelê Kurd e, ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo gelên Rojhilata Navîn jî pir girîng e. Ji ber ku di vê pêngavê de guleya yekemîn li pergala Modernîteya Sermayedar hate xistin. Ev çalekî tolhildana hezarên salan bû, têkoşîna exlaqî, çandî, polîtîk û leşkerî ya civaka nû îfade dike. Bi têkoşîna 15’ê Tebaxê re pêvajoyeke nû hate despêkirin. Li her derê gelê Kurd ji nû ve fêrî jiyanê bû.**R-5**

‘DYA ji bo berjewendiyên xwe ji rastiyê direve’

Nadine Maenza diyar kir ku dewleta Tirk guhertina demografîk li herêmên dagirkirî pêk tîn e û got, DYA ji bo berjewendiyên xwe rastiyê vedişêre.**R-3**

Bêdengiya li hember sûcên dagirkeriyê didome

Endama Kordînasyona Kongra Star sûcên tecawîzkirina jin û zarokan ji aliyê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ve li deverên dagirkirî şermezar kirin û destnîşan kir ku wan ew sûc belge kirine û şandine rêxistinên navneteweyî û yên jinan; lê belê ew rêxistinên bêdeng in.**R-3**

Bandora Fîşeka Yekem
Farûk Sakik R-5

Pêngava 15`ê Tebaxê bû pêngava azadiya jinê
Nehîr Pale R-2

‘Şerê Taybet bingeha civakê dike armanc’

Rêvebera Nivîsgeha Jin a Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê Evîn Bîlal diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker li kêleka êrîşên leşkerî yên ku li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin, şerekî taybet jî bi rêve dibe û ciwanan dike armanc.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Dewleta Tirk a dagirker bi tevahiya hêza xwe ya leşkerî êrîşên hovane yên ser herêmên bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin. Dagirkerî li kêleka êrîşên ser herêmê, şerekî taybet dide meşandin, di vî şerî de di asta yekê de jin û ciwanan dike armanc, dixwaze bi riya madeyên hişbir, torên medyayên civakî, belavkirina fihuşetê û teşwîqkirina ciwana li ser koçberiyê civakê ji bingeha wê ve, têk bibe.

Derbarê Şerê taybet yê ku dagirkeriya Tirk li ser çand û sincê civakê dide meşandin, herwiha armancên vî şerî, Rêvebera Nivîsgeha Jin ya bajarê Qamişlo Evîn Bîlal ji Rojnameya me re axivî.

‘Dewleta Tirk dixwaze nirx û sincê civakê têk bibe’

Evîn Bîlal diyar kir ku şerê taybet yê ku li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin, jin û ciwanan dike armanc û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker li ser gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi taybetî li ser jin û ciwanan şerkî taybet dide meşandin, dixwaze bi riya vî şerî qirkirneke çandî çêbike, ji ber ku huner û çand bi destê jinê hatiye avakirin, civak jî li ser vê bingehê bi 100'ê salan tê meşandin. Dijimin hewil dide bi van kiryarên xwe nirx û sincên civakê têk bibe. Lê li hemberî tevahiya hewildanên dagirkeriya Tirk, gelên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi têkoşîna xwe plan û êrîşên dagirkeran vala derxin.”

‘Em ê bi fikirê Rêber Apo Şerê Taybet pûç bikin’

Evîn Bîlal da zanîn ku jin û ciwan denemîkê civakê ne û wiha berdewam kir: “Jin û ciwan bingeha civakê ne, herwiha ew hêza berxwedan û têkoşînê ne. Ji ber vê yekê dewleta Tirk a dagirker dixwaze jin û ciwanan bi riya pişaftina ziman û sînordarkirina fikrên wan, civakê lawaz bike. Li hemberî şerê taybet pêwîstî bi rêxstinbûyîna li ser fikrê Rêber Apo heye. Ji ber ku tenê fikr û felsefeya Rêber Apo, dikare polîtîka û planên hêzên desthilatdar yên li dijî civakê vala derxe.”

‘Bi êrîşên xwe hunera kurdî jî dikin armanc’

Evîn da xuyakirin ku dagirkeriya Tirk bi êrîşên xwe yên ser herêmê hunera kurdî jî dike armanc û wiha pê da çû: “Huner xwedî kurahiyeke bê sînor e, ji bo gelê kurd jî huner hêza vejandinê ye, lewra dewleta Tirk a dagirker ji bo ku nerxên civakê têk bibe, hunera kurdî jî dike armanc. Lê em hunermendên Rojava, em ê bi riya parastina kevneşopî û hunera xwe êşê civakê veguherînin berxwedan û têkoşîna li hemberî dagirkeran.”



‘Divê Jin û ciwan li hemberî şerê taybet bêdeng nemînin’

Rêvebera Nivîsgeha Jin a Desteya Çandê a Herêma Cizîrê Evîn Bîlal balkişand ser erkê jin û ciwanan li hemberî Şerê taybet û axftin xwe wiha qedand: “Ji bo ku em şerê taybet yê ku li ser me tê meşandin û sîstema dewletê vala derxînin, pêwîste ku em her dem zindî bin, zindîbûneke ku bi şoreşê re, her êrîş û şerê li hemberî me tê kir wek qeder qebûl nekin. Bi têkoşîneke şoreşgerî ku bi riya Tevgera Azadiyê û felsefeya Rêber Apo di hunderê me de hatiye çandin, dijminan têk bibin. Divê jin û ciwan li hemberî şerê taybet bêdeng nemînin û bi erka xwe rabin.”

‘Em ê bi têkoşîn û ramanê azad tevahî jinan azad bikin’

Ronahî Sadûn/Qamişlo

Rîhan Loqo diyar kir ku kampaniya giştî ya KJK'ê ya ji bo piştgiriya jinên Şengal û Efganistanê bi piştgiriya tevahî Rêxistin û Saziyên jinan yên bakur û rojhilatê Sûriyê bi rê ve çû û got, Em ê bi têkoşîn û ramanên azad tevahî jinan azad bikin.

Bi Dîrok re û heta niha tê diyarkirin ku di tevahiya cîhanê de, qirkirineke bi hemû awayan li ser jinan tê meşandin. Herwiha di 3'ê Tebaxa 2014'an de, çeteyên DAIŞ'ê komkujiyên mezin li ser herêma Şingalê pêk anînin. Bi hezaran jin, zarok, pîr û kal Li pêşiya çavên tevahî cîhanê qetilkirin, bi hezaran jin û zarok revandin û hemû şêwazin tundiyê li ser jinan pêk anîn. Herwiha li aliyekî din jî, bi heman pilanê, li ser jinên Efxanistan di Tebaxa 2021'an de, piştî vekişandina Emerîka ji Efxanistan û bi derbasbûna Teleban re hate kirin. Derbarê kampaniya ku di 3ê`Tebaxê de ji bo piştgiriya jinên Şingal û Efxanistanê hat destpêkirin Berdevka Kongira Star Rîhan Loqo ji rojnama me re axifî.

‘Bi hevkariya PDK'ê komkujiya Şengalê pêk hat’

Rîhan Loqo diyar kir ku kampaniya giştî ya KJK'ê ji bo piştgiriya jinên Efxanistan û Şengalê ye û wiha got:”Bi yekîtiya jinên Êzîdî, Sûriyan, Turkmen, Ermen û tevahî Rêxistin û saziyên jinan yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo piştgiriya jinên Şengal û Efganistanê di 3`ê Tebaxê de dest bi kampaniyayê hate kirin. Ev 9 salin li ser qirkirina şengalê re derbas dibe, di 3`ê Tebaxa 2014`an de, hovîtiyeke mezin ji aliyê DAIŞ`ê û dagirkeriya tirk û bi hevkariya PDK'ê li ser civaka Êzîdî hate meşandin. Êrîşî şengalê kirin û qirkirinekî mezin li ser jin û zarokan, li pêşiya çavên cîhanê pêk anîn. Herwiha bi hevkarî û îxaneta PDK'ê ya ku pişta xwe da gelê şengalê û bû sersebebê ku rastî qirkirinê werin. “

‘komkujiyên li ser jinan wê bê bersiv nemînin’

Rîhan Loqo destnîşan kir ku di meha Tebaxê de piştî vekişandina Emerîka ji Efxanistanê, Teleban derbasî Efxanistanê bû û got:”Di heman mehê de wekî çawa DAIŞ derbasî Şingalê bû û komkujî pêk anî, Teleban jî bi heman hişmendiyê komkujî li ser jin û zarokên Efxanistanê pêk anî. Herwiha rojane li Efxanistanê êrîşên mezin li ser nasnameya jinan tê kirin. Ev êrîş ne tenê li ser jinên şingal û Efxanistane têne meşandin, li ser tevahî jinan tê meşandin. Li hemberî vê yekê jî her asta tekoşîna jinan bilind dibe, li ser vî bingehî, em wekî rêxistinên jin li Rojava piştgirtiya jinên Êzîdî û Efxanistan û tevahî jinên ku rastî tundiyê tên dikin. Piraniya jinên ku ji şengal derxistin derbasî bajarê bakur û rojhilatê sûriyê û bi taybet jî bajarê Reqa, yê ku DAIŞ'ê ji xwe re kiribû paytext û li wê derê qirkirineke mezin li ser jin û zarokan pêk anîn. Ji ber wê yekê di cihê ku tundî li ser jinan hate meşandin, bilindkirina asta tekoşîn, berxwedan, rêxistinbûyin, yekîtî û zanebûna jinan xwedî giringiyeke taybete û ev yek ji bona hemû hêz û aliyên ku destek dane çeteyên DAIş'ê bersiva herî bi wateye.

‘Dewlet heman hişmendiyê li ser jinê dide meşandin’

Berdevka Kongira Star Rîhan Loqo di dawiya axftina xwe de diyar kir ku armanca tekoşîna me ew e ku çawa jin li xwe xwedî derkevin û wiha got:” Ne tenê li jinên Şengal û Efxanistan xwedî derkevin, wekî jin ku li hemberî tevahî êrîşan xwedî li xwe derketin erka herî bingehîne. Herwiha di tevahî cîhanê de qirkirina li ser jinan nehatiye binavkirin, ev jî tê wateya ku hişmendiya dewletê çavkaniya hemû êrîş û tûndiya ku li ser jinê tê meşandine. Di hemû şerên ku ji dîrokê heyanî roja îro hatine meşandin de her tim jin hedef tê girtin û herî zêde jin dibin qurbana van şeran.

Ji bo wê jî pêwîste bi hişmendiya ku jinek qir kriin civakek qirkirine tevger were kirin û li hemberî hişmendiya paviksalarî û zihniyeta serdest kar û xebat were kirin. Tûndiya ku li ser jinê tê meşandin jî li ser asta cîhanê tê meşandin. Li hemberî vê tûndî û neheqiya ku li ser jinê tê meşandin jî bêdengî heye û ev tûndî jî roj bi roj zêde dibe. Ji ber vê yekê di serî de jina kurd, pêwîste ku hemû jinên cîhanî li hmberî vê şidet û tûndiya ku tê meşandin, mil bi mil û bi vîn û hişmendiya azadiya jinê rêxistina xwe xurtir bikin û li hemberî hişmendiya zilamê ser dest rawestin. Bi yekîtî û hevgirtina jinên azadîxwaz wê jin xwe bighîne avakirina jiyana azad. “

Ji Pênûsa Jin

Pêngava 15`ê Tebaxê bû pêngava azadiya jinê

Nehîr Pale

Îro dîroka jin tê nivîsandin, her tiştên wê têne belgekirin û êdî bi hezaran jin guhertinê dixwazin. Daxwaza azadî û wekheviya di navbera jin û mêr de li ser asta kesan nemaye, êdî ji berê gelekî zêdetir bûye û civaka cinsiyetparêz di nêzîkatiya xwe ji jin re hêdî-hêdî tê guhertin. Ev guhertin dibe ku ne lez be lê hêdî-hêdî lêgera jina azad li cem jinê belav dibe û zagonên zîhniyeta baviksalarî ji jin re danîne têne guhertin. Jina zana ew jina ku di fikir û ruh de bedew e.

Têkoşîna jin ji destpêka avakirina Tevgera Azadiyê dest pê kir, hevrê Sakîne Cansiz di berxwedaniya zîndana Amedê de hem li ber xwe da, radestî nebû û îradeya wê neşikest, vê yekê hêz da hemû jinan.

Bi pêngava 15`ê Tebaxê re hîn zêdetir çalak tevlî têkoşîna Tevgera Azadiyê bibin. Jinê ji gelek aliyan ve dest bi têkoşînê kir, ev têkoşîn di kesayeta gelek jinan de gihîşte asoyan. Bi sedan jinên têkoşer hatin avakirin, êdî wan fermandartiya şer kirin, berpirsyartiya çareserkirina pirsgirêka jin rakirin û weke Tevger xwe birêxistin kirin.

Şehîd Binefş Agal (Bêrîvan)ku sala 1986`an jî Ewrûpa tevlî Tevgera Azadiyê dibe û berê xwe dide çiyayên Botanê. Ew ji kurdên Êzidî bû, malbata wê ji ber zulma dewleta Tirk a dagirker koçî Ewrûpa bibûn, wê di temenê xwe yê 18 salî de vegeriya welat û çek rakir. Di nava gelê Botanê de xebitî û gel birêxistin kir, wextê ku leşkerên dewleta Tirk a dagirker bi tangan wê di malbatekê de dorpêç dikin, jê dixwazin ku radestî wan bibe, têkoşer Binefş vê yekê qebûlnake û heyanî şehîd dibe li ber xwe dide.

Gulnaz Qere Taş (Bêrîtan) jî sala 1990`î tevlî nava refên Tevgera Azadiyê dibe, li Tirkiyê ji aliyê leşkerên Tirk ve tê girtin û wê gelekî giran işkence dikin. Piştî ku ji girtîgehê berê xwe dide çiyayê Kurdistanê. Şehîd Bêrîtan dibe fermandara taximê. Dewleta Tirk a dagiker sala 1992`an li çiyayên Xakûrkê tevî her du partiyên Kurd ên Başûrê Kurdistanê dest bi operasyona Başûr dikin. Gerilayên Kurdistanê li hemberî vê operasyonê li ber xwe didin û yek ji pêşenga wan şehîd Bêrîtan e.

Fermandar Bêrîtan şervanên taximê ji çemberê rizgar dike û ew bi xwe heyanî guleya xwe ya dawiyê li hemberî dewleta Tirk a qirker û çeteyên wê û PDK'ê şer dike, di dawiyê de xwe ji zinarê çiyayê Xakûrkê davêje û teslîmiyetê qebûlnake.

Heval Zîlan (Zeyneb Kinacî) yek ji pêşengên jin in, sala 1994`an ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve tê girtin, piştî ku ji girtîgehê derdikeve ew û hevjînê xwe sala 1995`an berê xwe didin çiyayê Kurdistanê. Dewleta Tirk a dagirker bi destek dayîna dewletên herêmî û navdewletî li dijî Rêber APO komplo dikin, şehîd Zîlan li hemberî vê komployê bêdeng namîne û 30 Hezîranê çalakiyeke fedaî li dijî dewleta Tirk a dagirker kir. Helwesta wê li hemberî komplo gelekî xurt bû.

Şehîd Sakîne Cansiz, Binefş, Bêrîtan, Zîlan û hemû şehîd û têkoşerên jin bûn şopdarên pêngava 15`ê Tebaxê û têkoşîna xwe ya bi ruhê wê destpêkiribûn, berdewam dikin.

Şoreşa çandî û wêjeyî li Rojava

Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji bo civakê guhertin û veguhertinên mezin ji hemû milî ve pêkanîn. Wêjeya kurdî ya nûjen jî yek ji wan aliyên ku bi agirê şoreşê hat vejandin, helbestvanê kurd Necim Ebdullah(Elî Roj) diyar kir ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê bû bingeha pêşketina xebatên wêjeyî û çandî.

Ciwana Mûsa/Tirbesipiyê

Bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re asta wêjeya kurdî û bi taybet jî helbesta kurdî de pêşketinên ber bi çav pêkanîn. Di derbarê pêşketin û rewşa helbesta nûjen a kurdî de helbestvan Necim Abdullah bersiva pirsê rojnameya me da.

-Tu wekî helbestvanekî kurd ku di nava Şoreşa 19`ê Tîrmehê de jiyan kiriye, pêşketina helbesta kurdî ya nûjen çaw dinirxîne ?

Bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re gelek pêşketin çêbûn û gelek şoreş di hundirê şoreşê de pêkhatin; Şoreşa wêjeyî, çandî û civakî ev hemû beşên girêdayî hevin bi taybet şoreşa wêjeyê ku em li ser wê dixwazin rawestin. Berî şoreşê çiqas nivîskar û kesên ku bi zimanê kurdî ve mijûl dibûn jî hebûn, lê ji ber rewşa desthilatdarî, zilm û zordariya heyî, kesî nedikarî bi hesanî bi zimanê kurdî biaxive, binvîsîne û bixwîne. Heta di aliyê navlêkirina zarokên xwe de jî, navên kurdî qedexebûn. Gelek nivîskaran bi rengekî veşartî xebata xwe ya nivîskî dikirin, yan jî bi rengên cuda kar û xebatê xwe didane meşandin. Lê bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re rihetî û serbestbûnek çêbû û dibistan, zanîngeh û peymangehên bi zimanê kurdî hatin vekirin. Gelek derfet ji bona nivîskarên ku dixwazin binvîsin, bixwînin û berhemên xwe çapbikin vebûn. Êdî gelek berhem û xebatên wek çîrok, roman, helbest, rojname û kovarên bi zimanê kurdî hatin çapkirin û belavkirin. Di warê helbestê de jî, gelek helbestvanan helbestên kilasîk û yên nûjen jî nivîsandin. Weke ku em dizanin bingeha helbesta kurdî ya kilasîk gelekî resen û kûr e. Di serî de helbesvanên me yê bi nav û deng mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyra, Cegerxwîn û gelek helbestvanên din ên ku kedekî wan a mezin di warê pêşxistina ziman, wêje û bi taybet jî helbesta kurdî de heye. Celeba helbestvanên dema dawiyê jî, sûdeke mezin ji helbesta kurdî ya kilasîk girtine û li ser wî bingehî dest bi wêjeya nûjen kirine û di vî warî de ew jî xwedî kedeke mezinin di warê pêşxistina wêje û helbesta kurdî ta roja me ya îro. Bi pêşketina helbesta nûjen re jî, nayê wê wateya ku dema helbesta kilasîk derbas bûye, an jî êdî kes helbesta kilasîk ve mijûl nabe, berûvajî vê yekê gelek helbestvanên nû jî hene ku ji rêbazê xêzkirina helbesta kilasîk hez dikin û dixwazin pêşketinekî di vî warî de pêkbînin

Nûjentî jî ne bi rengê ku tu guhertinekê pêkbîne û ew guhertin berûvajîkirina helbesta klasîk be û wê ji reseniya wê derxîne. Bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re gelek berhemên wêjeyî derketin û piraniya wan girêdayî rastiya Şoreşa 19'ê Tîrmehê ne, rastiya berxwedanê, şehîdan û gelek aliyên din jî digirte nava xwe. Li beramberî helbestvanên me yên kilasîk û yên ku bi riya wêjeya kurdî çi ya devokî be an jî nivîskî be, ziman û çanda kurdî bi dirêjiya dîrokê parastin û pêşxistin. Ji ber vê yekê helbestvanên dema neha pêwîste ku helbesta kurdî ya kilasîk bixwînin û jê sûdê bigrin. Ger ku em bixwazin helbesta kurdî ya serbest û nûjen jî pêşbêxin, pêwîste ku li ser bingeha wêje û helbesta kurdî ya kilasîk be û ji cewherê xwe yê resen qut nebe.

Bandora Şoreşa 19'ê Tîrmehê û derfetên ku çêbûn e, gelek li ser wêjeyê heya ku em îro behsa helbest, nivîskarî û zimanê kurdî dikin. Tenê nirxandina wêjeyî kêm dimîne, anku asta helbestên ku îro têne nivîsandin, çapkirin û berhemên ku têne belavkirin, ast û naveroka wan çawe ye? Ger ku em şêwaza ku pê tê nivîsandin binirxînin, gelek aliyên wê yên kêm û yên ku pêwîste were nirxandin û sererastkirin hene.

-Sedema hilbijartina te ji nivîsandina helbestê re çi bû?

Nivîsadina helbestan ne ku mirov di destpêkê de hildibjêre, lê bingehê hin behreyan di dema zaroktiyê de bi mirov re nîşaneyê wê xuyadikin û piştî ku mirov mezin dibe ew behre jî bi mirov re mezin dibin. Hîn ez zarok bûm dema ku min berx li çol û beyaran diçêrandin, wê demê min xwe parçeyek ji xwezayê didît û ez bi ajalan re hevalbûm, bandora vê yekê heyanî roja îro jî li ser min heye. Civaka gundan jî, newekî ya bajaran ne. Ji ber ku mirov xwe li gundan bêtir azad û rehet dibîne û ji xwezayê re bêtir nêzîke.

Piştî ku em tevlî kar û xebatên Tevgera Azadiyê bûn û derbasî qadên çiya bûn, ji bona min mîna destpêka jiyaneke nû bû. Ji ber ku di jiyana gerîla de û di nava kûratiya erdîngariyê de mirov hîn bêhtir bi xwezayê re dibe yek. Di nava bedena xwezayê de û li serê çiyayên ku bilindiya wan dighêje ezmanan, jiyana bi wate û azad li wêderê mirov bi giyanê xwe hîs dike. Dûrî qerebalixa bajaran û ji sîstema desthilatdarên ku jiyana mirovan kirine dojeh û zindan. Li serê çiyayên azadiyê û di nava kûrahiya xwezayê de, jiyaneke nû tê afrandin, hevaltî, heskirin, şerê ji bona jiyanê, rastiya jiyana bi wate hîn baştir mirov bi çavê serê xwe dibîne û ji kûrahiya dilê xwe hîs dike.

Min di destpêkê de, dest bi nivîsandina helbestan bi zimanê erebî kir. Ji ber ku heyanî sala 2007an jî min nivîsandina bi zimanê kurdî nedizanî. Wê demê tenê min bi tîpên erebî yên ku me jêre digotin sormancî û yên ku ne dişibiyan zaravê soranî jî dizanîbûn binvîsin. Ji ber wê yekê dema ku derfeta fêrbûna bi zimanê kurdî û bi tîpên latînî ji bona me vebû, yekser min berê xwe da dibistana fêrbûna xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî. Wê demê û di nava rewşa şer û êrîşan de, herçiqasî dem teng bû jî, lê em di navbera 2 heyanî 3 mehan de fêrî xwendin û rastenivîsa bi zimanê kurdî bûn. Ji wê demê û şûn de min xwe fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî kir û heyanî roja îro jî ez hîn bi zimanê kurdî û erebî nivîsên xwe dinvîsînim.

Ji bona ku mirov bikaribe hestên xwe bi rengek ji rengên nivîsandina wêjeyî xêzbike, pêwîste ku di milê aso û hestên xwe de mirov pir kûr be û tişta ku her kes nabîne û hîs nake, tu bibîne û bi kûrahiya dilê xwe hîsbike. Ji ber ku helbestvan di demên asayî de nikare helbestan binvîse. Tenê di zirweta demên kêfxweşî, xemgînî, êş û rewşên xeternak de helbest têne nivîsandin. Di hindirê her mirovekî de kêm an jî zêde xalên ku hîs bike û binvîse hene. Anku di hindirê mirovan de gelek behreyên veşartî hene û pêwîste ku mirov wan nasbike û derxîne ronahiyê û wan pêşbêxe û bi derdorên xwe re parvebike. Li gorî vê yekê mirovê ku bi wêjeyê ve mijûl dibin, meyzandin û nêrîna wan ji bona hemû aliyên jiyanê tê guhertin. Mîna kesên din yên ku bi wêjeyê ve mijûl nabin, nêzî civak, jiyan, xweza û gerdûnê nebin. Meyzandina wan ji her tiştî re xwedî wateyeke cudaye, ew dixwazin ku bi helbestan teşeyê bidin her tiştî û di wesfê hûrguliyên jiyanê de her tim zimanê helbestê bikartînin. Ger ku derfet hebe jî wêjevan û helbestvan dixwazin di jiyanê de hemû axaftinên ku bilêv dike, bi rengekî helbestî bin.

-Helbest ji bo te tê çi wateyê?

Di serî de mîna ku Rêber Apo gotî: ‘Helbest rengek ji rengên azadiyê ye’. Ji ber ku di helbestê de her gotin û peyvên ku têne bilêvkirin û xêzkirin, ji ber xwe û bi rengekî serbest dikevin ser asoyê bîriyê û bi helbestî têne xêzkirin. Di nivîsandina helbestê de, mirov çi hîs dike dinvîse. Lê divê helbest û rastiya helbestvan hev bigre û hev temam bike. Helbest jî ji bo min lûtkeya hevaltî, ked, xweşikbûn, mirovahî, çand û dîrokê ye, û van hemûyan di nava xwe de digre. Helbest jî ne mîna cureyên din ê nivîsê ye, ji ber ku tu gotin û peyvên ku tu di helbestê de bikartîne, yek bi yek dineqîne û hildibjêre. Mirov nikare helbestê mîna gotarê bihesanî binvîse. Ji ber ku nivîsandina helbestê mîna fêkiya ku bi rengekî baş disewe û dem tê ku tu wê ji darê jêkê û bixwê. Helbest jî bi zora ku mirov bide ser xwe nayê nivîsandin û mîna fêkiya ku baş negihiştibe û tu wê jêbike, wê gavê wê neyê xwarin. Anku hizir, hest û aso dema ku hev temam neke nabe helbest.

- Ji bo pêşxistina wêjeya kurdî erkê ku dikeve ser milê helbestvanên ciwan?

Tişta ku ji me kurdan tevan tê xwestin çi helbestvan, nivîskar û rewşenbîr bin em zimanê kurdî bi pêş bixin. Ji ber ku zimanê kurdî bi lêkolîn, xwendin û nivîsandinê bi pêş dikeve. Tevî ew derfetên ku piştî Şoreşa 19`ê Tîrmehê derketine, lê hîn gelek ji me di bin bandora zimanên biyanî de mane. Bingehê Şoreşa 19`ê Tîrmehê ya ku me nêzî 12 hezar şehîd di oxira wê de dan, pêwîste em jî wek nivîskar, helbestvan bi erkê ku dikeve ser milê me rabin û di nava şoreşê de wekî pêşengê civakê tevbigerin. Pêwîste ku em vê yekê bi riya semîner, civîn û çalakiyan teşwîq bikin û di her beşê jiyana xwe de girîngiyê bidin zimanê kurdî. Ji ber ku gelek zimanên cîhanê yê ku zêde nedihatin bikaranîn û kes xwedî lê dernediket windabûne. Eger em xwedî li çand û wêjeya xwe dernekevin wê zimanê me jî xeterî li ser çêbibe ku were ji bîrkirin û ji holê rabe.

Radiyoya Rojava dengê berxwedana gelan e

Radiyoya Rojava di sala 2013'an li Qerçoxê destê bi weşana xwe kir, bû şopdara rastiyê û dengê berxwedanê. Endamên radiyoyê dan zanîn ku ew ê bi ruhê şehîdên şoreşê û li ser xeta şehîdên çapemeniya azad, li ser şopa heqîqetê û azadiyê, bibin dengê gel û şoreşê.

Mihemed Xanim/ Qamişlo

Yek ji gavên girîng di çapemaniya Rojava de, Radyoya Rojava ku di 1'ê Nîsana 2013'an de li çiyayê Qereçoxê kete weşanê. Rojava û herêmên bakurê û rojhilatê Sûriyê di dîrokeke tijî berxwedan û serkeftinên binirx re derbas bû. Radyoya Rojava jî şopdarê vê şoreşê bû û li gel pêşketinên leşkerî, siyasî û qada civakî para xwe di eşkerekirina rastiyê de hebû. Di rewşên zehmet de xwe gihandina hemû pêkhateyên herêmê û şiyariya civakî li hemberî dijminên dîrokî yên gelê bindest û azadîxwaz yek ji hedefên sereke yên xeta weşangeriya radyoya Rojava bû.

Êrîşên dagirkeriya Tirk

Dewleta Tirk a dagirker ji ber ku ji dengê rastiyê û berxwedna gelan ditirsiya, Çapemeniya Kurdî li Rojava û bi taybet Radiyoya Rojava kir armanca êrşên xwe. Dagirkeriyê di 25'ê Nîsana 2017'an de çiyayê Qereçoxê bombebaran kir. Di encamê de binesaziyên çiyayê Qereçoxê hilweşiyan ku yek ji wan avahiya jî Radyoya Rojava bû. Tevî van êrîşan di 10'ê Îlona 2018'an de careke din Dengê Rojava weşana xwe bi derfetên mezintirîn û berfirehtir li Rojava û herêmên bakurê Sûriyê li qadeke berfireh belav kir. Derbarê kar û xebatên Radiyoya Rojava Endamên radiyoyê Alaa Hiso û Şîlan Efrîn ji rojnameya me re axivîn.

Alaa Hiso balkişand ser destpêkirina weşana Radiyoya Rojava û wiha got: "Radiyoya Rojava di 1'ê Nîsana 2013'an ji çiyayê Qerçoxê yê girêdayî bajarê Dêrikê dest bi weşana xwe kir, di demên zehmet de û di şert û mercên giran de dest bi kar kir. Di wê demê de şervanên YPG'ê û YPJ'ê li hemberî hêzên tarî yên êrîşî Rojava dikrin, berxwedaniyek bêhempa didan meşandin, Radiyoya Rojava jî li kêleka şrvanan bû û rastiya berxwedanê kêlî bi kêlî dişopandin. Damezrandina Radiyoya Rojava yek ji berhemên Şoreşa 19'ê Tîrmehê ye, li ser bingeha fikrê Rêber Apo a Netewiya Demokratîk hat damezrandin. Herwiha ji bo azadiya gelan kar û xebat da meşandin."

'Radiyoya Rojava dengê berxwedana Şervanan ye'

Hiso da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker bi armanca qutkirina dengê rastiyê, êrşî Radiyoya Rojava kir û wiha domand: "Piştî ku 4 sal di ser destpêkirina weşana radiyoya Rojava re derbas bû, di 27'ê Nîsana 2017'an de, dewleta Tirk a dagirker bi 26 balafirên şer , êrîşî

çiyayê Qerçox ku navenda Radiyoya Rojava bû , kir. Di wê êrîşa hovane de 20 şervanên YPG û YPJ'ê şehîd ketin, 3'ê ji wan jî endamê ragihandinê û yên Radiyoya Rojava bûn; Şehîd Şîlan, Şehîd Heqî û Şehîd Rêwan. Armanca êrîşa li ser Qerçoxê û Radiyoya Rojava, qutkirina dengê azadiyê bû, ji ber ku radiyoya Rojava dengê berxwedana şervanan û gel ji bo cîhanê radigehand. Lê tevî êrîşa hovane jî, radiyoya Rojava bersiveke xurt da dagirkeriya Tirk û di Îlûna 2018'an de careke din dest bi weşana xwe kir. Endamê radiyoyo isbat kirin ku ti êrîş nikare dengê radiyoy qut bike, li hemberî îrşan îradeya wan xurtir û bilintir dibe. Em herdem li kêleka şervanên xwe bin û li her qadê dingê berxwedanê bin."

'Gav bi gav pêşketina Radiyoya Rojava berdewam e'

Hiso diyar kir ku Radiyoya Rojava ji tevahiya beşên civakê bernameyan pêşkêş dike û wiha axivî: "Radiyoya Rojava deng, helbest, berhem û efsaniyên berxwedaniyê yên şervanan radigihîne, kêlî bi kîlî dengê berxwedaniyê dişopîne. Piştî êrîşa dagirkeriya Tirk a li ser Qereçox, di 10 Îlûna 2018'an , radiyoya Rojava bi vîneke xurtir careke din weşana xwe domand, gav bi gav û sal bi sal radiyo Rojava pêş dikeve, herwiha weşana wê firehtir dibe. Niha 4 pêlên weşanê yên radiyo Rojava hene; li herêma

Cezîrê li ser pêlên 91.2 û 88. 90 tê guhdarkirin , li herêma Firatê li ser pêla 93.5 tê guhdarkirin û li Helebê, herêma Şehba, Izaz, Mari û Efrîna dagirkirî jî li ser pêla 108 Fm tê guhdarkirin. Radiyo ji seat 7'ê sibehê bi Sirûda Ey Reqîb dest pê dike, piştî wê bernama sibeha, nûçe, stranên şoreşgerî û filklorî tên pêşkêşkirin, radiyo di seat 11'ê êvarê de tê girtin."

'Em ê herdem dengê rastiyê bin'

Endamê Radiyoya Rojava Alaa Hiso axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi saya keda şehîdan radiyoya Rojava gavên xwe roj bi roj mezintir kir û hewil dide ku bibe mêvanê mala her kesî, herwiha tevahiya pêkhatiyan hembêz bike, ji ber wê bi zimanên Kurdî, Erbî bernameyên xwe pêşkîş dike. Bi deng û bernameyê xwe rastî, çand, geşedanên siyasî û tevahiya bûyerên girîng ji bo civakê ronî dike. Herwiha ji bo zarokan jî bername tên pêşkêş kirin. Radiyoya Rojava dengê gel e, ji ber wê civak ji me bawere, em ê jî li gorî baweriya civaka xwe bin û çi bê ser milê me em ê ji gel re pêşkêş bikin. Creke din em tevahiya şehîdên çapemeniya azad bibîr tînin, ku ji bo ragehandina rastiyê canê xwe feda kirine; wekî Canşêr Welat, Xerîb Welat, Mezlûm Bagok, Dilîşan Îbiş, Dilovan Gever, Mihemed Reşo, Mistefa Mihemed, Îsam Ebdullah û tevahiya şehîdên çapemeniya azad

û Tevgera azadiyê . Em soz didin ku em ê herdem dengê rastiyê bin û çanda gelê xwe bidin xuyakirin."

'Radiyoya Rojava reng , deng û nasnameya jinê ye'

Endama Radiyoya Rojava Şîlan Efrîn jî da xuyakirin ku bi pêşengiya jinê Radiyoya Rojava hat vekirin û wiha pê da çû: "Ez di sala 2018'an de tevlî xebatên Radiyoaya Rojava bûm. Radiyoya Rojava yek ji berhemên pîroz yên Şoreşa Rojava ne, berhemek ji fikrê Rêber Apo û Xwîna Şehîdan e. Çawa ku jin di tevahiya qadan de bûn pêşeng û kedeke mezin kirin, di warê ragehandinê de jî pêşengtî kirin. Herwiha di Radiyoya Rojava de jinê pêşengtiya yekemîn kir, hevalên jin erkê herî giran girtin ser milê xwe û bûn pêşeng. Ji ber ku jinê di tevahiya xebatên radiyoyê de pêşengin, radiyoya Rojava reng, deng û nasnameya jinê ye. Xebatkarên radiyoyê li kêleka şervanên xwe kêliyên berxwedanê dişopînin û ji cîhanê re radighînin, bi taybetî gav bi gav li kêleka YPJ'ê ne û pêşketinan dişopînin."

Endama Radiyoya Rojava Şîlan Efrîn axaftina xwe wiha qedand: "Bi ruhê şehîdên şoreşê û li ser xeta şehîdên çapemeniya azad di şexsê Xerîb, Rêwan, Heqî, Canşêr, Fîraz, Mezlûm, Keder, Arîn û bi ruhê berxwedana azadî û demokrasiya gelan, em ê li ser şopa heqîqetê û azadiyê, bibin dengê gel û şoreşê."

Zehmetiyên ku cotkar dikşînin ji ber dorpêçê

Cotkarên kantona Şehbayê ya dorpêçkirî piştî gelek zehmetiyan di çandina pîvazan de ji ber dorpêçê, berhema xwe ya pîvazan berhev dikin. Dorpêç, nebûna madeyên pêwîst ji bo çandiniyê û bihabûna wê, bandor li berhemê kir ku îsal kêm hate çandin.

Berhema pîvaz yek ji berhemên herî girîng a kantona Şehbayê ye ku şêniyên kantonê bi giranî debara xwe pê dikin. Her wiha ew berhem ji bo cotkaran jî ya herî baş û bi sûd e.

Li kantona Şehbayê 2 cûreyên berhema pîvaz hene; pîvazê zivistanê anku frensî û pîvazê şêrîn.

Pîvazê zivistanê di destpêka meha Çileyê de tên çandin û di mehên Tîrmeh û Tebaxê de tên çinîn. Pîvazê şêrîn jî di meha Îlonê de tê çandin û di meha Gulan an Hezîranê de li gor rewşa hewayê tê çinîn.

Li kantona Şehbayê ji ber dorpêça hikumeta Şamê û rêgirtina li ber derbaskirina madeyên sereke, zehmetiyên şêniyên kantonê û koçberên Efrînê zêdetir dibin.

Cotkarên kantonê ji ber dorpêçê gelek zirar dîtin ku nirxê semad û dermanên çandiniyê gelekî zêde

bû û ji bo pêxistina matorên avdanê jî mazot nedihat peydakirin.

Komîteya Çandiniyê ya Desteya Aborî ya Kantona Efrîn û Şehbayê destnîşan kir ku wan ji ber dorpêça hikumeta Şamê nekarî pêdiviyên cotkaran wek mazot ji bo avdanê û semad û dermanan peyda bikin ku di encamê de rewşa çandiniyê li kantonê paşve çû û di serî de jî çandiniya pîvazan.

Komîteyê diyar kir ku îsal 700 hîktar pîvaz hatin çandin ku sala borî rûbera çandinê zêdetirî 800 hîktarî bû û ev rûber ji ber dorpêça hikumeta Şamê kêm bû.

Tê payîn ku mewsima îsal dê zêdetirî 35 hezar ton pîvaz berhem bide ku herêm dê bigihîje asta xwetêrkirinê û nirxê her kîloyek li gor cûreyê pîvazê ji hezar û 300 heta 3 hezar û 600 lîreyên sûriyeyî be. **ANHA**

'15'ê Tebaxê pêngava hêvî û biryardariyê ye'

Gerîlaya YJA Starê Zîlan Aydin û gerîlayê HPG'ê Seydo Destîna 15'ê Tebaxê Cejna Vejînê pîroz kirin û gotin, Pêngava 15'ê Tebaxê rêyeke ronî nîşanî gelê Kurd da.

Gerîlaya YJA Starê Zîlan AYdin û gerîlayê HPG'ê Seydo Destîna bi wesîleya salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê ji ANF'ê re axivî.

Gerîlaya YJA Starê Zîlan Aydin bi pîrozkirina Pêngava 15'ê Tebaxê dest bi axaftina xwe kir û destnîşan kir ku îro li çeperên berxwedanê bi ruhê Pêngava 15'ê Tebaxê li dijî dijminê dagirker şer dikin.

Zîlan Aydin ragihand ku gerîlayên HPG û YJA Starê berdêla xwe çi dibe bila bibe li dijî êrîşên dewleta Tirk ti carî serî netewandine û got, "Li gel berxwedana gerîla, têkoşîna gelê me yê fedakar gelekî girîng e. Gelê me xwedî li gerîla derdikeve, li dijî dagirkeran têdikoşe, berdêlên giran dide. Em 15'ê Tebaxê careke din pîroz dikin ku cejna vejînê ya gelê Kurd e.

'Em sekna serok Apo ji xwe re dikin esas'

Pêngava 15'ê Tebaxê ji berê ve ji bo me bû hinceta bilindkirina têkoşîn û berxwedana me, rabûna li ber teslîmiyetê. Êrîş çiqasî giran dibin bila bibin, çekên kîmyewî çiqasî têne bikaranîn bila bên bikaranîn, em ê ti carî paşve gavê neavêjin. 40 sal in em têdikoşin, em ê 40 salên din têbikoşin. Weke Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê em xeta mîrateya hevalên Egîd, Zîlan, Bêrîtan ji xwe re dikin esas û di vê rêyê de dimeşin. Em berxwedana xwe roj bi roj mezin dikin. Niha li her qada Kurdistanê operasyonên ji bo tunekirina gerîla dewam dikin. Gelê me bila zanibe ku zarokên vî welatî wê dest ji têkoşîna xwe bernedin. Di van operasyonan de me berdêlên giran, nirxên mezin dan. Gelek hevrêyên me yên leheng heta fîşeka xwe ya dawî li ber xwe dan, şehîd bûn. Bi vê wesîleyê hevrêyên me yên şehîd careke din bi rêzdarî bi bîr tînim. Em soza xwe dubare dikin ku hêjayî mîrateya wan a berxwedanê bin. Em sekna Rêber Apo ji xwe re dikin esas."

'Em ê tola şehîdên xwe hilînin'

Gerîlayê HPG'ê Seydo Destîna destnîşan kir ku Pêngava 15'ê Tebaxê ji bo gelên bindest û azadîxwaz gelekî girîng e û got, "Pêngava 15'ê Tebaxê rêyeke ronî nîşanî me da. Hevalê Egîd piştî Pêngava 15'ê Tebaxê nîşanî me da ku gelê Kurd li hemberî dewleta Tirk, li hemberî dagirkeran çawa dikarin biparêzin. Gelê Kurd û Tevgera Azadiyê ji sala 1984'an û vir ve li ser vê xetê meşiya. Di serî de li Zap, Metîna, Avaşîn û Xakurkê, li Herêmên Parastinê yên Medyayê berxwedaneke gelekî mezin tê kirin. Dijmin bi her cûreyî çekan bi kar tîne, lê belê tevî teknîk û teknolojiya xwe jî bi gavekê nikare bi pêş ve biçe. Ev têkoşîna gerîla xwe dispêre Pêngava 15'ê Tebaxê. Çi dibe bila bibe em ê heta dawiyê li ber xwe bidin û tola şehîdên xwe hilînin." **ANF**

Ji jinên Efgan ji bo TAJÊ name: Em serbilindin ku mil bi mil têdikoşin

Jinên Efgan, ji bo TAJÊ ku bi wan re dinav piştvaniyê de ne, nameyek şandin di nameye de gotin; "Bi îlham û hêza ku me ji bilindbûna qehremantiya jinên Îranê û tevgera Kurdistanê girtiye em serbilindin ku mil bi mil têdikoşin."

Di salvegera dûyemîn ya ji aliyê Talîbanê ve desteserkirina rêveberiya Efganistanê de, jinên ku li dijî Talîban û welatên ku piştgiriya Talîban dikin têdikoşin, ji bo jinên Kurdên Êzidî ku bi wan re

di nava piştevaniyê de ne li ser navê Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) nameyek şand. Jinên Efganî di nameya xwe de bal kişandin ser giringiya têkoşîna bi hev re û gotin: "Em bi têkoşîna bi hev re serbilind in."

Li ser navê jinên Efgan jina têkoşer a bi navê Ferîba name nivîsand û di nameya ku bi gotina; 'Silavên şoreşgerî ji bo hevalên şer dikin re' destpê kir, wiha berdewam kir: "Di destpêkê de di salvegera dûyem ya dijminê jinan celat Talîban desthilata Efganistî xistî destê xwe de, em spasiya xwe pêşkêşî xwişkên xwe dikin ku bi jinên Efgan re di nav piştevaniyê de ne. Mixabin ew atmosfera ku di nava welat de hakim, her roja ku diçe xirabtir dibe. Qada xebatên şoreşgerî û çalakiya jinan teng dibe. Di roja meya îro de mafê herî bingehîn yê jiyanê weke mafê kar û perwerdê û mafê cil û berg li xwe kirinê tê tunekirin, ew wehşeta ku tê jiyankirin, qada bê ewle û xizanî jiyana gel tarî kiriye, hêviya jinan û têkoşîan wan berdewam dike. Em weke jin dengê xwe di her pencereyê de li dijî faşîzma olî ya Talîbana xulamê emperyalizma Amerîka bilind dikin û têkoşînê dikin. Bi îlhama ku me ji bilindbûna qehremantiya jinên Îranê û tevgera Kurdistanê girtî, em serbilindin ku mil bi mil têdikoşin. Ji bo we xwişkên me yên giranbûha bi hezkirina bê dawî." **JÎNHA**

Bêdengiya li hember sûcên dagirkeriyê didome

Endama Kordînasyona Kongra Star sûcên tecawîzkirina jin û zarokan ji aliyê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ve li deverên dagirkirî şermezar kirin û destnîşan kir ku wan ew sûc belge kirine û şandine rêxistinên navneteweyî û yên jinan; lê belê ew rêxistin bêdeng in.

Der barê sûcên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî şênî û jinên deverên dagirkirî de, nexasim vê dawiyê ku endamê "meclisa xwecih" a navçeya Cindirêsê Zekeriya Bustanî û kurê wî Nesir Bustanî zarokeke keçîn

revand û tecawîz lê kir, endama Koordînasyona Kongra Star Elîf Mihemed ji me re axivî.

Di çarçoveya van rêzesûcan de, berpirsên Tirk û serçeteyên wan tecawîz li 3 mamosteyên dibistaneke Cerablusa dagirkirî kir. Her wiha serçeteyekî "Ceyş El Şerqiye" gefa tecawîzkirinê li keçên welatiyekî navçeya Cindirêsê xwar heke pere nede wan.

Elîf Mihemed destnîşan kir ku hejmara sûcên li herêmên dagirkirî tên kirin, ji yên ragihandî pirtir e. Elîf diyar kir ku di Tîrmeh û Tebaxê de çeteyên dewleta Tirk a dagirker tecawîz li zêdetirî 20 jin û 5 zarokên keçîn kirine.

Elîf wiha domand: "Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê Efrîn veguhastiye qada pêkanîna sûcan û navenda çêkirin û belavkirina nakrotîkê."

Elîf diyar kir ku rêxistinên navneteweyî û yên jinan li hember kiryarên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî jinên Efrînê bêdeng in û got: "Me gelek sûc belge kirin û bi rêya Rêxistina Mafên Mirovan Efrîn – Sûriye ji bo wan şandin, lê belê dîsa jî bêdeng man."

Elîf di dawiyê de banga destwerdaneke lezgîn kir ji bo ku sûcên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li dijî jinên Efrînê û hemû deverên dagirkirî bên rawestandin. **ANHA**

'DYA ji bo berjewendiyên xwe ji rastiyê direve'

Nadine Maenza diyar kir ku dewleta Tirk guhertina demografîk li herêmên dagirkirî pêk tîn e û got, DYA ji bo berjewendiyên xwe rastiyê vedişêre.

Seroka Sekreteriya Desteya Navneteweyî ya Azadiya Olî û lêkolînera Navenda Wilson a Amerîkayê Nadine Maenza têkildarî êrişên artêşa Tirk a dagirker, guhertina demografiya herêmên dagirkirî, her wiha helwesta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ji ajansa ANHA'yê re axivî.

Nadine Maenza diyar kir ku Tirkiyê bi awayekî eşkere guhertina demografiyê pîk tîn e û got, Tirkiye koçberên ji deverên din tîne û li deverên Kurdan bi cih dike, di heman demê de dest datînin ser malên Kurdan, mesîhî û êzidiyan.

Nadine Maenza da xuyakirin kku DYA di hinek xalan de berjewendiyên xwe yên bi Tirkiyeyê re di ser eşkerekirina heqîqetê re digire û got: "DYA li

pêşberî hinek mercan e ku hewl dide Tirkiyeyê nêzî xwe bike û rê li ber wê bigire da ku xwe nêzîkî Rûsyayê neke. Metirsiyên rasteqîn hene ku têkiliyên her du welatan xirab bibin. Lê ya ku Tirkiye dike DYA'yê bi hêrs dike. Yên xetên sor an jî sînoran derbas bikin, qetilkirina sivîlan bidomînin û îstiqrara herêmê xirab bikin, divê ji aliyê DYA'yê ve werin muhasebekirin".

Nadine bang li Amerîkayê kir ku li hember dewleta Tirk a dagirker bisekine û êrişên wê rawestîne

Nadine Maenza di dawiya axaftina xwe de got kiryarên dewleta Tirk a dagirker ne li gorî berjewendiyên DYA'yê û ne li gorî yên gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne.

Cejna 15'ê Tebaxê

Cîger Dilşad

Rêber Apo 15'ê Tebaxê wekî welidandina xwe ya duyemîn pênase dike. Ji lewra di serî de ceja 15'ê Tebaxê li Rêber Apo pîroz be! Herwiha li hemû şehîdên têkoşîna azadîyê, gerîlayan,gelên me û mirovahîyê pîroz be!

PKK wekî partîya şehîdan tê pênase kirin. Di serî de li ser bingeha bîranîna Hakî'yan hate damezrandin û herwiha ma. Roja ku PKK ji xeta şehîdan derket,wê bibe her tiştê lê wê qet nebe partîya azadîyê ya ku Rêber Apo avakirîye. Gava em li dîroka PKK dinêrin vê rastîyê dibînin; PKK çiqas û kengê di xeta Rêbertî û şehîdan de meşîye ewqas bi serkeftî meşîye, berevajî wê jî raste. Mînaka wê ya herî şêmber pêvajoya salên 2000-2004 e.

Hin kes û derdorên ku rastîya dîrokê nas nakin û ji realîte ya Kurdistan'ê qutin dibêjin; "şer! çawa çê dibe ku şer dibe cejn?"

Gava em li dîrokê dinêrin,em dibînin ku piranîya cejnên ku ji hêla gel,ol û neteweyan ve têne pîroz kirin an roja destpêka têkoşîna wan e, an jî roja ku şer-têkoşîna wan fêkî daye û azad bûne ye.

Em werin ser rewşa Kurdan; berîya 15'ê Tebaxê ji her alî ve li ser Kurdistan'ê koletîyeke tîr hatibû ferz kirin; li bakur piştî sala 1938 ango piştî tepsandina berxwedana Dêrsimê perdeya tarîtîyê kişandibûn ser gel,ku piştî Makezagona 1924'an qedexekirina ziman û çanda Kurdan,peyva Kurd bûbû egera dayîna cezayên giran,ango bi temamî jîneke dojehî ferz kir bûn.(hinek kes dibêjin;"serhildana Dêrsim'ê"ev pênasekirin,ne rast e! Li Dêrsim'ê tişta qewimîye,êrîşa neyar bû û Seyid Riza û gelê Dêrsim'ê li dijî wê qirkirinê li ber xwe dan. Ev ,mijara nivîseke dine),li başûr;piştî pejrandina M.Mistafa Barzanî Aşî BATAL,Sedam serwerîya xwe li her alîyê başûr dabû rûniştandin.(ku Aşî BATAL bi temamî qebûlkirina teslîmîyetê ye),li rojhihat her çiqas rihmetî Ş.Ebdulrihman QASIMLO hinekî hewldanên wî û hevalên wî hebûn jî,lê têrê nedikir ku tova şahîyekê di asta şahîya cejnê de di cenga gelan de bivejîn e. Ji xwe desthilatdarîya Xumeynî ya netewperestîya Îranî di bin kirasê Şîtî'yê de dabû serwer kirin,li rojava jî bi tenê di hêla çandî de hinek hewldanên lewaz hebûn(ku ta ji heyama HAWAR'ê ve mabûn).

Xûlaseya gotinê ew e ku,berîya 15'ê Tebaxê li seranserî Kurdistan'ê zilm û zilumateke mezin serwer bû.Mirovê/a Kurd ji rastîya xwe û ya welatê xwe baz dida, te digot qey ji nexweşîya pençeşîrê direve,wisa ji warê dê û bavan direvî. Qirkirina spî bi her awayî di meryetê de bû. Kurdên ku mîna Şêr û şepalan di dîrokê de dihatin nasîn,dagerîbûn şêr û şepalên bê diran,bê neynok! Tu dibêjî qey kesayeta Kurd ketibû rewşa menapozê û hew malzaroka kesayeta Kurdan kesên mîna Kawa ,Kumata,Zerdeşt,Manî,Pakîze,Rabî a,Zarîfe û...û Besê'yan diwelidîne!

Tu kesî/ê nedigot ;"

"Kanê Baba Hatemê Loristanî
Û kanê Baba Lorey Loristanî
Kanê Behlûlê Mahî Deynewerî
Kanê Baba Nicûmê Loristanî

Kanê Rihan Xanima Loristanî
Û Celale Xanima Loristanî
Kanê Lîza Xanim û Xatûn Mey Zerd
Kanê Fatime Loriya Goranî

Kanê Ebulberakatê Hekarî
Tacûl Arifîn, Hesenê Hekarî
Û Nazdar Xatûna Şîraziya çak
Kanê Nêrgiz Xanima Şarezorî

Kanê xatûn Zerbanûya Derzyanî
Û Mestûre Xanima Kurdistanî
Ka Dayrakî Rezber û Mele Xidir
Kanê Senem Xanima Dewdanî

Kanê Mecbûrî û Ehmet Pirisî
Şêx Adî û Ehmet Begê Komasî
Kanê Cîhan Ara Xanima çeleng
Kanê Xurşîde Xanima Dawaşî

Ka Elî Herîrî, Feqiyê Teyran
Meleyê Cizîrî û Ehmedê Xan
Ka Eliyê Teremoxî û Siyahpûş
Ka Bekir Begê Erzî û Miradxan

Ka Pertew Begê Hekarî û Selîm
Xaris Bedlîsî û Xelîfe Selîm
Kanî Mele Xelîl û Şêx Mehmedcan
Kanê Seyd Qojî û Seyd Can ên Dêrsim

Kanê Nalî û Nizamî Gencewî
Fatma Reş û Hecî Qadirê Koyî
Ka Baba Tahir û Xanzade Sultan
Kanê rind Passa Xatûna Efrînî"(Ji pirtûka Ahmed HUSEYÎN; Axîna DILISTAN -1-)

Bi taybetî jî li bakur piştî cunte ya 12'ê îxaneta Şahîn DONMEZ were girtin hatibû kirin) Mazluman dest pê kiri bû, bi Ferhatan domandibû û Xeyrî û Kemalan berxwedan gihandibûn lûtekyê,divîya bû bersiveke dîrokî bihata dayîn! Rêber Apo xeta wan pêşengan di komcivîna duyemîn de kir xeta PKK û wê yekê rê li ber tesfîyekaran girt! Ev e,Rêber Apo di mercên ku bi xwe tê de bi zorê dijîya de,bingeha pêngava 15'ê Tebaxê avêt. Şehîdên zîndanê rêya vegera welat vekir û Rêbertîyê fermana wan bi cih anî. Ji lewra Rêbertî berdevk û nûnerê şehîdan e!

15'ê Tebaxê çî ye?

15'ê Tebaxê ne bi tenê fîşeka ewil e ku Egîdan di serê neyar de teqandî,di gel wê rastîyê 15'ê Tebaxê;

Fîşeka di kesayeta Kurdê tisonek de hatî teqandin e.

Vejînkirina Kurdê nîv mirî nîv sax e,ango têkûzkirina Kurdê ne mirî û ne sax e!

Hilweşandina qereqolên di mêjîyan de ye.

Destpêka qetandina zincîrên koletîya jine.

Derxistina vîna azad e.

Jîyankirina heqîqeta şehîdan e û pêkanîna daxwazên wan e.

Vejînkirina rastîya Kurd û Kurdistan'ê ye.

Rêgirtina li îxanetkirina Kurdan li rastîyên xwe ye.

Şilftazîkirina îxaneta ku ji Enkîdo dest pê kirî û Harpagos domandî û heta malbata Barzanîyan hatîye,ye,

Rêvekirina ji derketina wêjeyeke realîst ya civakî ye.

Rakirina toza li ser dîroka kurdan û jinê ye.

Rêgirtina li pergala Modernîte ya kapîtalîst,ku ji salên 1800'an ve hewl dide ku li heremê serwerîya xwe bide rûniştandin û ber bi encamê ve diçû,ye.

Birqandina rêbertîyeke civakî ji gel û ji bo gela ye.

Ji Kurdê tune hatibû hesbandin,avakirina Kurdê azad e.

Dîyarkirina vîna jînkirina wekhev a bi gelên heremê re ye.

Ji Kurdê/a ku li paş dîrokê hatibû hiştin,gihandina wî/wê dîtin û felsefa jîyana azad û kirina wî/wê xwedî hêza jîneke hemdem e.

Xweşik kirina Kurda ye;mirovê/a kole ne delal e û di her hêlê de pîs û qirêj e.

Ji Kurdê/a ku nedizanî hez bike û nedihat hezkirin afirandina Kurdê/a ku xwedî pîvan û dizane hez bike û were hezkirin(kesên kole ne têne hezkirin û ne jî dizanin hez bikin!)

Ji Kurdistan'a ku ji Kurdan û gelan re dagerandibûn dojehê,derxistina Kurdistaneke bihûştî,

Jînkirina demokrasîya rasteqîn e.

Çandina tova jîyaneke bi rengê jinê hatîye xemlandin û awa-gîyan girtîye ye.

Jînkirina rastîya Rêbertîyê û şehîdan di her kêlîya jîyanê ye.

Xwenûhkirina malzaroka kesayeta Kurda ye.

Ji ber van sedeman û yên ku me nehejmartine,15'ê Tebaxê CEJNEKE NETEWÎ Û MIROVAHÎYÊ YE! Çimkî bi gîyana 15'êTebaxê ne bi tenê Kurd azad dibin, her wiha gelên Ereb,Tirk,Fars,Ermen,Aşûr û yên din jî azad dibin! Çawa bi Newroz'a Med'î re gelên heremê ji bin zor û serdestîya serdestên Aşûrî (DI serî de gelê Aşûr azad bû)rizgar û azad bûn,wê bi gîyana 15'ê Tebxê re jî Rast nivîsandina dîroka Kurdên kevnar û nexşandina ya hemdem e.

Ronahîkirina gelên heremê ye.

Ne bi tenê destpêka azadkirina gelê Kurd e,her wiha destpêka şikandina qeydên koletîyê ya ku gelên dewletên dagirkerên Kurdistan pê hatine girêdan e jî.

gelên heremê û mirovahî jî gaveke girîng ber bi azadîyê ve biavêje.

Bi kurtasî 15'Tebaxê biriqandina destana ku li gundê Amara di 4'ê Avrêla sala 1949 de dest bi hûnandina wê bûbû,li ber bendava Çibûqê bi gotina;"Kurdistan mitingehe" û bi avakirina PKK re awayekî nû ya jînkirinê standibû û bi berxwedana Mazluman,Ferhatan, Xeyrî û Kemalan re gihabû pêvejoyeke nû, ye!

Di şûna encamê de vê bêjin;15'ê Tebaxê di her kêlîyê de jînkirina rastîya Rêbertîyê û şehîdan li me ferz dike! Me heta îro tam li gorî tê xwestin gîyana pêngava 15'ê Tebaxê jîyan nekirî ye. Heger me jîyan kiriba,wê Rêbertî dîl nehatiba girtin û em ê ji zû ve gihabana mafên xwe.

Îro 15'ê Tebaxê;

1-xwedî derketina li Rêbertîyê ye,
2-rûniştandina deh boyutan e,
3-malkirina şoreşê li gelên heremê ye,
4-vegera li rastîya Rêbertî û devberdana ji madîyetê ye,
5-ne bi tenê bi Egîdî şerkirine,her wiha bi Egîdî jînkirina felsefa Modernîteya Demokratîk e,
6-bi qasî jînkirina rastîya Rêbertîyê ye ewqas jî belavkirina felsefa Rêber Apo ye,
7-bi jin re rastkirina têkilîyan,rêzgirtina ji vîn û ramanên jin û hevaltîdostanîyeke rast bi jin re ye,
8-li her derê jînkirina bi awayê gerîla û xwe gihandina rastîya gelê şoreşger e,
9-şikandina vîna neyaran û bi neyaran pejrandina vîna gelan e,
10-doh ji boyî kurdistaneke serbixwe,yekbûyî û mirafah bû,îro ji boyî Kurdistaneke azad û Sûrî'yeke-Iraq'eke-Îran'eke demokratîk e!

Bi kurt û kurmancî; di roja îro de 15'ê Tebaxê xwedî derketina li hemû nirxên şoreşê yên madî û manewî ye!

Di rojhilata navîn de gelê bê hêza leşkerî mahkûmî mirinê ye.Di pêvajoya êrîşa DAIŞ'ê de ew rastî baştir derket holê! Ji lewra ji berîya nan û avê divê em wekî gelên di çembera mirinê da ne, pêhtir li HPG,YJA STAR,YBŞ,YPG,YPJ xwedî derkevin û çeka xwe ya parastinê mezintir û xortir bikin. Nexwe em ê wekî gel û pêkhateyên heremê çem û çem biçin! Heger em dixwazin di dawîyê de bikenin,divê ku em bizanibin îro sîngê xwe bidin ber her zorîyê. Rêber Apo hema hema her tişt ji me re afirand û em bi çek kirine. Bi tenê li me maye ku em biryara jînkirin, parastin û pêşxistina gîyana15'ê Tebaxê bidin.

Careke din di kesayeta fermandarê mezin Mahsum KORKMAZ(Egîd) de hemû şehîdên şoreşa azadî û demokrasîyê bi bîr tîn in û bejna xwe li ber wan ditewîn in û soza pêkanîna daxwazên wan nûh dikin.

Pêngava 15'ê Tebaxê bû bingeha Şoreşa Rojava

Pêngava 15'ê Tebaxê azadiya nasnameya gelê Kurd e, ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo gelên Rojhilata Navîn jî pir girîng e. Ji ber ku di vê pêngavê de guleya yekemîn li pergala Modernîteya Sermayedar hate xistin. Ev çalekî tolhildana hezarên salan bû, têkoşîna exlaqî, çandî, polîtîk û leşkerî ya civaka nû îfade dike. Bi têkoşîna 15'ê Tebaxê re pêvajoyeke nû hate despêkirin. Li her derê gelê Kurd ji nû ve fêrî jiyanê bû.

Birûc Resûl/Qamişlo

Berxwedana gerîla ya şoreşgerî ku bi pêşengiya fermandar Egîd (Mahsûm Korkmaz) di 15`ê Tebaxa 1984'an de li Şemzînanê fîşeka destpêkê li dijî dewleta Tirk a dagirker teqand, ket sala xwe ya 39`an. Berxwedana 15'ê Tebaxê ku di serî de li Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê deng veda, tarîtiya 12`ê Îlonê ronî kir û vejîna Mezin da gelê Kurd. Ev vejîn bi şoreşa Rojava re kete qonaxeke nû.

Endamên malbatên şehîdan ya bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axifîn û diyar kirin ku guleya yekemîn a di 15'ê Tebaxê de hate avêtin, gelê Kurd ji nû ve bi têkoşînê ve girê da û hişyar kir.

'Pêngava 15'ê Tebaxê roja vejîn û hebûnê ye'

Eyda Xelîl dayika Şehîd Orhan, ku di têkoşîna azadiya Kurdistanê de şehîd bû, diyar kir ku 15'ê Tebaxê ji bo gelê Kurd qonaxeke dîrokî ye û got:"Ji serhildanên din cudatir, pêngaveke xwedî girîngiyeke dîrokî ye. Bi vê destkeftiya dîrokî re, gelê Kurd di nava têkoşînê de aktîf bû. Bi guleya yekem re baweriya her kesî ya bi azadkirina Kurdistanê mezin bû."

'Pêngava 15'ê Tebaxê bû bingeha Şoreşa Rojava'

Eyda Xelîl diyar kir ku tovê destpêkê yê şoreşa Rojava di 15'ê Tebaxê de hat çandin û got:"Ew fîşeka li Şemzînan hat avêtin, li Rojava encamê wê bi şerê li dijî DAIŞ`ê û dagirkerên tirk li cîhanê deng veda. Şoreşa Rojava parçeyekî 15'ê Tebaxê ye. Şoreşa Rojava bi saya van gavên dîrokî pêk hat. Gelê Kurd li Bakur, Rojava, Rojhilat û Başûr di pêngava 15'ê Tebaxê de azadiya xwe dît û li dora Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) bû yek. Ciwan ji bo tevlî têkoşîna azadiyê bibin, li her derê seferber bûn."

'Berxwedana 15'ê Tebaxê gelê Kurd ji xewa mirinê şiyar kir'

Eyda Xelîl wiha berdewamî da axaftina xwe û got:"Ev tevgera ku bi pêşengiya Rêber Apo hate avakirin û îro li cîhanê tev belavbû û di dilê gelê Kurd û hemû mirovên azadî xwaz de xwedî wateyeke cudaye. Bi guleya destpêkê re tevgera azadiyê li ber xwe da û li dijî hişmendiya dewleta tirk a faşîst û qirker şer kir. Berxwedana 15'ê Tebaxê gelê Kurd ji xewa mirinê şiyar kir û bû çirûska destpêka têkoşînê li çar parçeyên Kurdistanê."

'Şoreşa Rojava dewama pêngava 15'ê Tebaxê ye'

Eyda wiha axaftina xwe domand û got:"Berî pêngava 15`ê Tebaxê, kurd hatibûn tune kirin bê nasname, ziman

Eyda Xelîl

Cîhan Gilo

Xêriya Hesen

hatibûn hiştin û ji mafê xwe bêparbûn. Pêngava 15`ê Tebaxê ji bona gelê Kurd bû riya vejîneke nû û bê tirs gelê Kurd li hemberî dijminî xwe sekinî û daxwaza mafê xwe kir. Di heman demê de pîngava 15`ê Tebaxê, deng veda tevahî kurdistanê û şoreşa Rojava jî dewama pêngava 15'ê Tebaxê ye."

Eyda Xelîl wiha axaftina xwe bi dawî kir û got: " Em wekî malbatên şehîdan pêngava 15`ê Tebaxê, di serî de li Rêber Apo, li şehîdên şoreşê, li gelê welatparêz, li hevalên hebis û zindanan pîroz dikin. Herwiha em soza xwe di vê roja pîroz de nûdikin. Ji ber ku roja 15`ê Tebaxê roja dayikbûna gelê kurd e.

'Bi berxwedana 15`ê Tebaxê vejîna gel pêk hat'

Cîhan Gilo dayika Şehîd Lewnd diyar kir ku di 15`ê Tebaxa 1984'an de guleya yekemîn bû sedema tirsê di nava dijmin de û di nava gelê Kurd de hêviyek mezin ava kir û got:"Piştî berxwedana 15'ê Tebaxê, gelê Kurd bêhtir bi têkoşîna azadiyê ve hat girêdan. Guleya destpêkê ya 15'ê Tebaxê, psîkolojiya têkçûnê ya ku gelê Kurd di pêvajoyên berê de derbas kiriye. Bi ruhê berxwedanê yê li zindana Amedê li ber xwe da, bi 15'ê Tebaxê re rabû ser piyan."

Cîhan da zanîn ku tu kes ne li bendê bû ku PKK`ê di wê pêvajoyê de ew qas mezin bibe û got:"Ji ber ku hemû tevgerên Kurdan hatin têkbirin û pêşengên wan hatin qetilkirin. Di vê pêvajoyê de pêşengên PKK'ê di zindana Amedê de rastî îşkenceyên giran hatin. Lê li Rojava gelê Kurd bi vê tevgerê ve girêdayî bû û em jî di nav de bûn. Tevger nû bû, zehmetiyên madî û manewî hebûn. Tevî van hemûyan jî gel her tiştê xwe seferber dikir, ji bo ku ev tevger bi ser bikeve. Ev tevger bi têkoşîna gel a bi vî rengî li Rojava belav bû. Gelê me ji ber zilma giran a pergalên faşîst ên li her çar parçeyên Kurdistanê, bê hêvî bû. Di pêvajoyeke wiha de 15'ê Tebaxê hêvî da me hemûyan. Ji her alî ve vejîna gel pêk hat."

'Gel bi fikir û felsefeya Rêber Apo bawer e'

Cîhan wiha berdewamî da axaftina xwe û got: pêngava 15'ê Tebaxê bandoreke mezin li ser tevgerên siyasî yên

li Rojhilata Navîn kirin. Bi vê çalakiyê re gelê Kurd serkeftineke siyasî û leşkerî bi dest xist. Her kes Kurdan li Rojhilata Navîn nas dike. Îro li gelek deverên cîhanê tevgerên jî Ewropayê ji bo nasandina şoreşa Rojava cihê xwe di nava tevgera azadiyê de digrin, ev berdewamiya ruhê 15'ê Tebaxê ye. Divê em bi hemû gelan re vê têkoşînê mezin bikin. Ji bona ku em têkoşînê mezin bikin, pêwîste ku em fikir û remanê Rêber Apo bighînin tevahî cîhanê û ji bona azadiya Rêbertî bi roj şev di nava tekoşînê de bin.

'15`ê Tebaxê bû riya azadiya jinê'

Cîhan Gilo wiha dawî da axaftina xwe û got:"Beriya vê tevgerê jin di nava çar dîwaran de bû. Dema tevgera azadiyê guleya 15'ê Tebaxê avêt, rê li ber têkoşîna azadiya jinan hate vekirin. Bi dehan fermandarên wekî Zîlan û Bêrîtanan ji bo azadiya jinên Kurd xwe feda kirin. Bi şoreşa Rojava re jinên Ereb jî di vê têkoşînê de roleke aktîf lîstin. Divê em fikir û felsefeya ku Rêber Apo ji bo azadiya jinan afirandiye tacîzdar bikin. Em wekî malbatên şehîdan û wekî jin, pêngava 15`ê Tebaxê li Rêber Abdullah Ocxalan pîroz dikin, her wiha li hemû jinên Kurd û yên azadî xwaz pîroz dikin."

'Pêşengê pêngava 15'ê Tebaxê fermandar Egîd bû'

Xêriya Hesen xuşka Şehîd diyar wiha axifî û got: "Pêngava 15'ê Tebaxê çalakiyeke azadiyê ya mezin û dîrokî ye, ku bi pêşengiya gerîlayên azadiya Kurdistanê,li dijî dewleta tirk a faşîst û dagirker derket. Ji bo gelê Kurd bû wesîleya ku cewherê xwe nas bike û ji nû ve hişyar bibe. Ev pêngava ku di pêşengiya fermandarê mezin Egîd (Mahsûm Korkmaz) de dest pê kir, ji bo gelê Kurd û dîroka Kurdistanê bû xala veguherînê û ji nûve xêzkirina dîrokê. Gelê Kurd ê ku mehkûmî tunebûnê bû, bi Pêngava 15'ê Tebaxê re ji nû ve li Kurdistanê Şoreşa Vejînê pêk anî."

'15'ê Tebaxê bû roja vejînê ji bona tevahî Rojhilata Navîn'

Xêriya diyar kir ku çalakiya 15'ê Tebaxê ji bo gelê Kurd bû despêkek û got:"15'ê Tebaxê ne tenê ji bo gelê Kurd, di heman demê de bi belavbûna fikir û felsefeya Rêber Apo re, li tevahiya Rojhilata Navîn, bû roja vejînê. Bi damezrandina Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) re, gelê Kurd li çar parçeyên Kurdistanê têkoşîna xwe ya azadiyê destpêkir û heyanî roja îro jî û bi hemû hêza xwe hîn gelê Kurd ji bona jiyana azad têdikoşe. Vegeza azadiya kurdistanê PKK'ê li Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê deng veda û ji hemû gelan re bû riya xelasî û azadiyê."

Xêriya Hesin dawî da axaftina xwe û got: "Bi tevgera azadiyê re baweriya gelê Kurd hîn mezintir bû û riya xwe ya siberojê hîn baştir naskir. Vê baweriyê bandoreke mezin li her çar parçeyên Kuristanê kir. Wê demê berxwedana zindanan dest pê kir. Ev jî ji dewleta tirk a faşist re weke şeqamekî bû. Herwiha bi vê tevgerê û bi ruh û fedekariya Rêber Apo, gelê Kurd hat ser hişê xwe. 39'e mîn Salvegera Pêngava dîrokî ya 15'ê Tebaxê, di serî de li Rêber Apo, gerîla û gelê Kurd û li hemû gelan em pîroz dikin. Di şexsê fermandarê mezin ê pêngavê hevrê Egîd de tevahî şehîdên şoreşa azadî û demokrasiyê bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin. Di dawiyê de em soza xwe dubare dikin ku, em ê têkoşîna azadiyê ya ku di xeta pêngava 15'ê Tebaxê de dest pê kirî, ber bi serkeftinê ve bibin.

Bandora Fîşeka Yekem

Farûk Sakik

Mîmarê teoriya 'fîşeka yekemîn' Dr. Frantz Fanon digot;"Fîşeka ku gelên di bin mêtingeriyê de li dijî dijminê xwe diteqînin, di heman demê de li dijî tirsên xwe yên melisî, kesayetiya xwe ya bizdiyayî û vîna xwe ya şikestî jî diteqînin"

Gerîlayên Tevgera Azadiya Kurd, di 15'ê Tebaxa 1984'an de bi pêşengiya fermandarê efsanewî Mahsûm Korqemaz bi navê din Egîd, avêtin ser navçeya Erûh û şerê çekdarî dane destpêkirin. Kurdan jî ew roj vê fîşeka yekemîn di mejiyê dewleta Tirk a mêtinger de teqandin.

Tevgera Azadiyê bi vê pêngavê, rêveberiya Tirk şoke kir û peyama 'dema hesab-pirsînê hat' da. Piştî serhildanên bi komkujiyan hatibûn rûxandin Kurd ji nasnameya xwe dûr ketibûn.

Polîtîkeyên dewletê yên qirkirin, tunekirin, red kirin û asîmilasyonê bi ser ketibû. Bêdengî hebû.

Dengê fîşeka yekem ku li Erûhê bilind bû, bêdengiya salan parçe kir. Gerîlayên kurd bi vê çalakiyê, li hemberî polîtîkaya tunekirin û înkarê destê bi têkoşîna çekdarî kirin.

Gerîlayan bi vê çalakiyê, berjêrçûna qedera gelê Kurd rawestand, dîroka gelê Kurd guhert.

Ji ber vê têkoşînê, Kurd û kurdîtiya li ber tinebûnê bûn, ji nû ve vegeriyan ser dika dîrokê.

Tevgera Azadiya Kurd, di encama têkoşîn û berxwedana dîrokî de, doza Kurd xist rojava dewletên serdestê û hemî derdoran.Tevgera Azadiya Kurd dema ku beriya 39 salan ev çalakî pêk dianî, xwedî hêzeke pir piçûk bû. Lê belê ew tevger bi pêşengiya Rêber Apo, îro bûye tevgera milyonan û dikare bandorê li tevahiya cîhanê bike. Di encama vê fîşeka yekem de di salên 90'î de serhildanan dest pê kir. Bersiva hovîtiya dewleta Tirk; şewitandina gundan bû.

Mîmarê vê fîşeka yekem jî Rêber Apo bû. Kesî bawer nekir ku piştî darbeya 12'ê Îlonê tevgera xwe PKK'ê biparêze. Lê wî rabû şer da destpêkirin. Dîsa di salên 90'î de di siyaseta demokratîk de gavên mezin hatin avêtin. Bersiv; Kuştin girtin û windakirin bû. Rêber Apo ev car di warê siyasî de dest bi hevditinan kir. Û di sala 1993'an de pêvajoya agirbest û aştiyê da destpêkirin. Di serî de serokomarê demê Turgut Ozal gelek kesan pê bawerî anîn û ketin nav hewldanan. Lê hin hêzên tarî ketin dewrê û Ozal kuştin.

Piştî vê yeke bêdengî çêbû. Tevgera Azadiya Kurdistan li Bakur di qada legal de birêxistin dibû. Êriş hebûn. Komplo hatibû destpêkirin û Rêber Apo dîl hatibû girtin. Lê Rêber Apo, Îmralî veguhêrt qada têkoşînê. Stratejiyeke wisa bi pêş xist, me dît li Osloyê hevditinên bi dewletê re destpêkirine. Di sala 2013'an de muzakereyên bi Rêber Apo re ku wê 3 salan dewam bike destpêkirin. Cîhanê jî hêza Rêber Apo re şahidî kir. Bersiv; di sala 2015'an de şer dane destpêkirin.

Îroj ji her alî de êrişî doza Kurdistan tê kirin. Li Îmralî tecrîda li ser Rêber Apo. Li Bakur êrişên li ser siyasetmedaran û gel. Li Herêma Paraştina Medya şer û berxwedana gerîla. Li Rojava êrişên li ser ştatuya rêveberiya xweser hene. Kurdistan rojên dijwar,zor û zehmet dijî. Dixwazin destkeftên ku 15'ê Tebaxê di hişmendiya kurdan de afirand, tunebikin. Îro mirov dikare bibêje bi şerê taybet hin encam bi destê hatine xistin. Bandor li hin kesan kir ku îro di nav civakê de şikeştin û bêdengiyek heye. Li bendê ne ku vê rewşa xirab bidin seknandin.

Tevgera Azadiyê li rêyek çareseriyê digere. Li pêngaveke nû, li fîşekeke din digere.

Rêber Apo di rewş û rojên zehmet de çareseriyek dîtibê wê îro jî rêyekî bibîne. Û îroj bi hezaran Egîd hene ku li gorî perspektîfên Rêber Apo û bi pêngaveke nû, wê şikeştin û bêdengiya heye berteraf bike.